# Çiyayê Kurmênc li ( 5 ) Tebaxa 2006 an Reş girêda

***Li** roja şemiyê ( 5 ) î Tebaxa 2006 an , li ser nîvro bi beşdariya cemawerekî mmezin ji xelkê herêma Efrîna bi xemgîn û herêmên derdorê , termên ( 23 ) hemwelatiyên Kurd ( yên ku , bûne qurbana bombekirina ne mirovane yê balefirên Israîl , li ser sînora Sûriyê û Libnanê ) di goristana bajaroka Cindrrêsê de hatin veşartin.*

Di veşartinê de , ji berpirsiyarên dewlwtê yên fermî , parêzerê parêzgeha Helebê û miftiyê komarê hazirbûn , li aliyê din şandek ji rêber û berpirsyarên Partiya Yekîtî ya Demoqrata Kurd li Sûriyê jî beşdar bû û serên xwediyên wan pakrewwanên şrê hovîtiyê saxkirin .

Lê zarzimanê xelkê herêmê û hemî kesên dilpak , gotina siloganî ya dewletê şermezardikir ya ku , ta li cihekî weha herêm kurd , mirî kurd , goristan kurd û cemawer kurd dîsa jî bihna şofenîzma Erebî jê hildikelî lê dîsa kues bi dengekî bilind digot bila şerê Israîl ya hovane li ser libinanê bisekine , bila zarzimanê mêjî û aştiyê li şûn wê bigire .

Vaye emê li jêr navên wan kuştî û şehîdan bijmêrin :

1- Almaz Birîm – keça Mihemed – Şiyê ( gundê Erendê ) .
2- Esed sîdo – Erendê .
3- Şukrî weqas - Erendê .
4- Reşîd Ezet Me'idan - Erendê .
5- Ezîze Ezet Me'idan - Erendê .
6- Rojîn Hesen - Erendê .
7- Ferîd Hesen - Erendê .
8- Aytan Bekir - Erendê .
9- Henan Osman kurê şêx Heder – gundê Çolaqa .
10- Ebdilrehman Bekir kurê Ehmed Cemîl Horo – Çolaqa .
11- Mihemed Ebdo Elîko – Gundê Me'imila .
12- Mihemed Mihemed Elîko - Gundê Me'imila .
13- Mizgîn weqas – Baziya .
14- Ofê weqas - Baziya .
15- Nîdal Yaqûb lawê êbdilrehman – Birka .
16- Mihemed Yaqûb lawê êbdilrehman – Birka .
17- Hesen Eyûş lawê Cemîl – Şiketa .
18- Reşît Eyûş lawê Neşet – Şiketa .
19- Mistefa Eyûş lawê Neşet – Şiketa .
20- Mihemed Xemîs – Cindirêsê .
21- Hisên Reşît – Cindirêsê .
22- Wehîd Şêxo – Hmşelekê .
23- Mihemed Osman lawê Mihemed – Tirmûşa .
24- Ehmed Cemîl Horo – Çolaqa – ew jî li ( 6 ) Tebaxê hate veşartin .

Bi navê komîta rêvebir a weşana Newwrozê û xwendevanên wê em bi dengekî bilind vî şerî şermezardikin û şerê xwediyên kuştiyan çaxdikin û sebir û aramiyê jêre dixwazin .